Karesata kîmyabarana Helebçê nayê jibîrkirin!

34 sal berî niha di 16ê Adara 1988 rejîma faşîst ya Êraqê bi çekên kîmyayî êrîşî Helebçê kir. Di encama vê karesatê de zêdetirî 5000 kurdên sîvîl şehîd bûn û bi dehan hezaran kes birîndar û koçber bûn. Her wiha jîngeha dewerê jî hate jehrawî kirin û nebadên jiyanê dar, giya û hemû ajal, ji jîngeha der û dorên Helebçê hatin kuştin û jinavbirin.

Kîmyabarana Helebçê û dewerên din yên Kurdistanê beşek bû ji operasyona Enfalê ya rejîma Ba'sî ya Sedam Huseyn bo cenosîdkirina gelê Kurd. Karesata Enfal û kîmbyabaranê heya îro jî birînekî giran ya jiyana xelkê dewerê ye. Hêj jî gelek ji şehîdên Enfalê winda ne an nehatine vegerandin bo axa Kurdistanê. Bandora wê trajediyê hêj jî dibe sebebê mirina pêşwext ya xelkê dewerê û beşek zêde ji zarokan nexweş û kêmendam li dayik dibin.

Dagîrkerên Kurdistanê gaza kîmyayî û çekên din yên komkujiyê li hemberî gelê me li hemû beşên Kurdistanê bikaranîne. Desthilatên dagîrker yên Tirkiye, Îran, Êraq û Sûriye di nav sed salên bihûrî de zêdeyî milyonek kurd kuştine û hêj jî li ser siyaseta cenosîdkirina netewa kurd berdewam in.

Em bangî komelgeha navneteweyî û hemû rêkxistinên mafê mirovan li cîhanê dikin ku çavên xwe li binpêkirina mafên rewa yê gelê kurd negirin, û dijî êrişên rejîmên Tirkiye, Îran, Êraq, û Suriyê li hemberî kurdistaniyan, rawestin. Em daxwaz ji Neteweyên Yekgirtî û hemû hikûmetên demokratîk dikin kîmyabarana Helebçê û komkujiya Enfalê bi fermî weke cenosîd nas bikin.

Em şehîdên komkujiya Helebçê û hemû Kurdistanê bi rêz we bi bîr tînin.

Komîteya birêveberiya Konfederasyona Kurdên Diaspora - Diakurd
16/3/2022

کارەساتی کیمیابارانی هەڵەبجە لەبیرناکرێت!

34 ساڵ لەمەوبەر لە 16ی ئازاری 1988 ڕژێمی فاشیستی عێراق بە چەکی کیمیایی هێرشی کردە سەر هەڵەبجە. لە ئەنجامی ئەم کارەساتەدا زیاتر لە 5000 هاوواڵاتی کورد شەهید و بە دەیان هەزاریش بریندار و ئاوارە بوون. هەروەها ژینگەی ناوچەکە ژەهراوی کرا و دار و گیا و هەموو ئاژەڵەکانی دەوروبەری هەڵەبجە لەنێوبران.

کیمیابارانی هەڵەبجە و شوێنەکانی تری کوردستان بەشێک بوون لە ئۆپەراسیۆنی ئەنفالی ڕژێمی بەعسی سەدام حوسێن بە ئامانجی جینۆسایدکردنی گەلی کورد. کارەساتی ئەنفال و کیمیابارانیش هێشتا برینێکی سەختە بۆ سەر ژیانی خەڵکی ناوچەکە. تا ئێستاش زۆرێک لە شەهیدانی ئەنفال بێسەروشوێن و یان نەگەڕێندراونەتەوە بۆ سەر خاکی کوردستان. کاریگەریی ئەو تراژیدیایە هێشتا دەبێتە هۆی مردنی پێشوەختەی خەڵکی ناوچەکە و بەشێکی زۆر لە منداڵان بە نەخۆشی و کەمئەندامی لەدایک دەبن.

داگیرکەران لە هەموو بەشەکانی کوردستان گازی کیمیایی و چەکی دیکەی کۆمەڵکوژییان لە دژی گەلەکەمان بەکارهێناوە. دەسەڵاتدارانی تورکیا و ئێران و عێراق و سوریا لە ماوەی سەد ساڵی ڕابردوودا زیاتر لە ملیۆنێک کوردیان کوشتووە و هێشتاش لە سیاسەتی جینۆسایدی گەلی کورد پەیڕەوی دەکەن.

داوا لە کۆمەڵگای نێودەوڵەتی و سەرجەمی ڕێکخراوەکانی مافی مرۆڤ لە سەرتاسەری جیهان دەکەین کە چاو لە پێشێلکردنی مافە ڕەواکانی گەلی کورد نەکەن و لە دژی هێرشەکانی ڕژێمەکانی تورکیا و ئێران و عێراق و سوریا لە دژی نەتەوەی کورد ڕاوەستن. داوا لە نەتەوە یەکگرتووەکان و هەموو حکوومەتە دیموکراتییەکان دەکەین کە بە فەرمی کیمیابارانی هەڵەبجە و کۆمەڵکوژی ئەنفال بە جینۆساید بناسن.

شەهیدانی کۆمەڵکوژیی هەڵەبجە و هەموو کوردستان بە ڕێزەوە بەبیر دێنین!

کۆمیتەی بەڕێوەبەریی کۆنفیدراسیۆنی کوردانی دیاسپۆرا - دیاکورد
16/3/2022

The Halabja Chemical attack will not be forgotten!

34 years ago, on March 16, 1988, the Iraqi fascist regime attacked Halabja with chemical weapons. As a result of the massacre, more than 5,000 civilian Kurds were martyred and tens of thousands were injured or displaced. The environment was also poisoned and the trees, grass, and all animals were destroyed by the attack.

The chemical attack on Halabja and other areas of Kurdistan were part of Saddam Hussein's Ba'athist regime's Anfal operation to commit genocide against the Kurdish people. The Anfal massacre and chemical attack are still a serious threat to the lives of the people of the region. Many of the martyrs of Anfal are still missing or have not been returned to the territory of Kurdistan. The impact of that tragedy is still due to the premature death of the people of the region, and a significant part of the children are born sick and disabled.

The invaders of Kurdistan have used chemical gas and other mass-destruction weapons against our people in all parts of Kurdistan. The governments of Turkey, Iran, Iraq, and Syria have killed more than a million Kurds over the past hundred years and are still pursuing the policy of genocide against Kurdish nation.

We call on the International Community and all Human Rights Organizations around the world not to close their eyes to the violation of legitimate rights of the Kurdish people, and to stop the attacks by the Regimes of Turkey, Iran, Iraq, and Syria against the Kurds. We call on the United Nations and all democratic governments to formally recognize the Halabja chemical attack and the Anfal massacre as genocide.

We remember the martyrs of the Halabja massacre and all of Kurdistan with respect.

Executive Committee of the Kurdish Diaspora Confederation - Diakurd
16/3/2022

Felaketê kîmyavarnayişî yê Helebçê nêyeno vîra kerden!

34 serr verê cû 16î aşmê Adar 1988 de rejîmo faşîst yê Iraqî bi çekanê kîmyayî êrîşî Helebçê kerd. Netîceyê na felaketî de 5000 zafêr kurdî sîvîl şehîd bîyê û bi des hezaran kes birîndar û koçber bî. Wina tebîatê dormareyî zî ame jehr kerden û nebatê heyatî dar, vaş û heme heywan, tebîatê dormareyê Helebçeyî ameyî kişten û tune kerden.

Kîmyavarnayişê Helebçeyî û dormareyî bîn yê Kurdistanî, semedê qir kerdişê şarî Kurdîstanî, operasyonê Enfalî yê rejîmê Baasî yê Sedam Huseynî ra yew qisim bi. Felaketê Enfalî û kîmbyavarnayiş heta ewro zî yew rîşa giran yê xelkê dormareyî ya. Hema zî zaf şehîdê Enfalî vîndî bîyaye yî û laşê înan nêameyî Kurdîstan. Bandorê na trajedî hema zî bena sebebê merdişê bêwext yê şarê dormareyî û zaf domanê nêweş û kêmendam yenê dinya.

Îşxalkeranê Kurdistanî heme parçeyanê Kurdistanî de, gazo kîmyayî û çekê bînî yê komkiştişî verba şarê ma şoxilnayê. Desthilatanê erişker, Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye mîyanê se serranê vîyarte de, yew milyon ra zaf kurd kiştê û hema zî siyasetê cenosîdkerdişî netewa kurd dom keno.

Ma gazî komelgeha mîyanneteweyî û heme rêkxistinanê heqî însanan yê cîhanî kenê ke verba binpaykerdişê heqanî gelê kurd çimanê xo nêqefilnê, û verba êrişanê rejîmanî Tirkiye, Îran, Iraq, û Suriyê yê verba kurdistaniyan, vinderê. Ma Neteweyanê Yewbîyayî û heme hikûmetanê demokratîk ra wazenê ke kîmyavarnayişê Helebçeyî û komkiştişê Enfalî bi fermî sey cenosîd nas bikerê.

Ma şehîdanê komkiştişê Helebçeyî û heme Kurdistanî bi rêz yad kenê.

Komîteyê rayîrraberdoxîye Konfederasyonê Kurdanî Diaspora - Diakurd
16/3/2022